

CENGNAMEYEKE KURDÎ: XEZWETU HUNEYNA MELA YASÎNÊ ALIKÎ¹

Seher KARAK

KURTE

Cengname yek ji wan cureyên edebî-qehremanî ye ku behsa şer û cengê dikin. Di nav edebiyata rojhilatî de cureyeye berbelav e. Mînakên vê cureyê di edebiyata Erebi, Farisî û Tirkî de gelek caran tene dîtin. Bi taybetî di edebiyata Tirkî de gelek berhem bi vê cureyê hatine nivîsîn. Di edebiyata Kurdî de jî mînakên vê cureyê tene dîtin. Xezwetu Huneyna Mela Yasîne Alikî yek ji cengnameyên Kurdî ye. Mela Yasîne Alikî yek ji wan helbestvanên sedsala 20 em e û li Panosê hatiye dinyayê. Alikî li cem gelek kesan perwerde wergirtiye û ders daye çendîn kesan. Alikî alim û melayekî serdema xwe bûye. Alikî li dû xwe 5 helbest û berhema xwe ya bi navê Xezwetu Huneyn hiştine. Berhema navborî behsa şerê Huneynê dike ku di serdema Hz. Muhammed de pêk hatiye. Xezwetu Huneyna Alikî Cengnameyêke Îmamê Elî ye. Cengnameyên Îmamê Elî ew berhem in ku behsa qehremanî û şervaniya Îmamê Elî dikin. Di Xezwetu Huneynê de Îmamê Elî şervanekî bêhempa ye. Berhema Alikî bi awayekî menzûm hatiye nivîsîn û bi tevahî ji 373 bendan pêk tê. Ev berhema Alikî berhemê girîng e û di cureya cengnameyê de valahîyêke muhîm tije dike. Sê nusxeyên destnivîsên Xezwetu Huneynê hene û di vê xebatê de dê ev berhem bi berfirehî were nasandin û ji hêla naverok û teşeyê ve were analîzkirin.

Peyvên Sereke: Cengname, Xezwetu Huneyn, Mela Yasîne Alikî, Îmamê Elî, Menzûme

¹ Ez xebat ji teza nivîskarê ya bi vî navî hatiye hilberandin: Bişaroğlu, S. (2022). Cengnameyêke Hezretî Elî: "Gezwetu Huneyn" a Mela Yasîne Alikî (Metin û Lêkolîn). Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî. Mêrdîn: Zanîngeha Mardîn Artukluyê. Enstîtûya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî.

Seher KARAK,
seherbisar@gmail.com,
Orcid: 0000-0001-9873-4456

Article Type/Makale Türü:

Research Article/Araştırma Makalesi
Received / Makale Geliş Tarihi: 15.08.2023
Accepted / Makale Kabul Tarihi: 26.09.2023
Published / Makale Yayın Tarihi: 30.09.2023
DOI: 10.35859/jms.2023.1344059

Değerlendirme ve İntihal/Reviewing and Plagiarism:

Bu makale iki taraflı kör hakem sistemine göre en az iki hakem tarafından değerlendirilmiştir. Makale intihal.net adlı intihal sitesinde taranmıştır. / This article has been reviewed by at least two anonym reviewers and scanned by intihal.net plagiarism website.

Citation/Atf:

Karak, S. [2023]. Cengnameyêke Kurdî: Xezwetu Huneyna Mela Yasîne Alikî, The Journal of Mesopotamian Studies, 8 (2), ss. 213-238, DOI: 10.35859/jms.2023.1344059.

Kürtçe Bir Cengname: Mela Yasînê Alikî'nın Xezwetu Huneyni

ÖZ

Cengname, savaştan ve mücadeleden bahseden edebi-kahramanlık türlerinden biridir ve Doğu edebiyatında yaygın bir türdür. Arap, Fars ve Türk edebiyatlarında bu türün örneklerine çokça rastlanılmaktadır. Özellikle Türk edebiyatında bu türde çok sayıda eser verilmiştir. Bu türün örneklerine Kürt edebiyatında da rastlamak mümkündür. Mela Yasînê Alikî'nin Xezwetu Huneyn (Hüneyn Gazvesi) adlı eseri Kürtçe yazılmış cengnamelerden biridir. Mela Yasînê Alikî 20. yüzyıl şairlerinden biridir ve Patnos'ta doğmuştur. Alikî birçok kişiden eğitim almış ve birçok kişiye ders vermiştir. Alikî, devrinin âlimi ve din adamlarından biridir. Alikî'nin şüana kadar tespit edilen 5 şiiri ve Xezwetu Huneyn adlı eseri vardır. Bu eser Hz. Muhammed döneminde yaşamış gerçek bir savaş olan Hüneyn Savaşını konu almaktadır. Alikî'nin Xezwetu Huneyn adlı eseri, bir Hz. Ali cengnamesidir ve Hz. Ali cengnameleri, Hz. Ali'nin kahramanlıklarını ve savaşçı ruhunu anlatan eserlerdir. Alikî Hz. Ali cengnamelerinin Kürtçe'de de olmasını istediği için böyle bir eseri yazmıştır. Alikî'nin Xezwetu Huneyn adlı bu eseri Kürt edebiyatında manzum yazılmış 373 bentlik bir cengname örneğidir ve türü yönünden önemli bir boşluğu doldurmaktadır. Bu eserin üç el yazma nüshası mevcuttur ve bu çalışmada Xezwetu Huneyn adlı eserin geniş bir şekilde tanıtılıp eserin şekil ve içerik yönünden analizi yapılacaktır.

Anahtar Kelimeler: Cengname, Xezwetu Huneyn, Mela Yasînê Alikî, Hz. Ali, Manzume

A Kurdish War Story: "Khazwetu Huneyn" Work of Mela Yasînê Alikî

ABSTRACT

War story (cengnameh) is one of the literary-heroic genres about war and struggle and is a common genre in Eastern literature. Examples of this genre are common in Arabic, Persian and Turkish literature. Numerous works of this type have been given, especially in Turkish literature. Examples of this genre can also be found in Kurdish literature. Mela Yasînê Alikî's Khazwetu Huneyn is one of the cengnamehs written in Kurdish. Mela Yasînê Alikî is one of the 20th-century poets and was born in Patnos. Alikî was one of the scholars and clergymen of his time. Alikî has five poems identified so far and a work called Khazwetu Huneyn. This work is about the Battle of Huneyn, a real war that took place during the reign of Muhammed. Ali's work Xezwetu Huneyn, a Caliph Ali's war story. These are works that describe Caliph Ali's heroism and warrior spirit. Ali wrote such a work because he wanted his war stories to be in Kurdish as well. This work of Alikî, Khazwetu Huneyn, is an example of a 373-verse war story written in verse in Kurdish literature and fills an important gap in terms of its genre. There are three manuscript copies of this work, and in this study, the work named Khazwetu Huneyn will be widely introduced and analyzed in terms of the form and content of the work.

Keywords: War Story, Xezwetu Huneyn, Mela Yasînê Alikî, Caliph Ali, Poem

Extended Abstract

War stories are literary texts describing war and battle. For this reason, the authors preferred a simple and understandable language when writing their war stories. In addition to the characteristics of the period in which they were written, the terms religion and war are abundant in the war stories. Especially religious motifs are quite common in the war stories written in the name of Caliph Ali. When we look at the war stories written to spread Islam, it is seen that these war stories are more common in the Middle East geography. Due to this geography being among the places where Islam first spread, the war stories drew a lot of attention here. We come across examples of this genre in

Arabic, Persian, Turkish, and Kurdish literature. Particularly in Turkish literature Caliph Ali's war stories have become quite popular and many works of this type have been written. When we look at Kurdish literature, such works were written as The Narration of Black Horse (Qewlê Hespê Reş), The Narration of Siseban Valley (Qewlê Newala Sisebanê), Silêmanê Sindî, The Conquest of Khyber (Fetha Xeyber), Xhazawat of Bedir an Huneynê and also Mela Yasîne Alikî's Khazwetu Huneyn are some of the works given in the genre of war stories.

Mela Yasîne Alikî, was born in 1898/1901(?) in Patnos and passed away in Patnos in 1976. Alikî got married once and had 7 children from this marriage. Mela Yasîne Alikî belongs to the Alikan tribe and used the name Alikan as a pseudonym in his work Khazwetu Huneyn. Mela Yasîne Alikî was trained and approved by scholars such as Feqe Reşîdê Alikî, Mela Zahirê Memanî, Mela Qasimê Pozreş, Sheikh Nesîmê Kufrewî, Sheikh Muhammedê Arvasî and Mela Ehmedê Kurumzade.

After his education, Mela Yasîne Alikî worked as an imam and a professor in various villages and taught many people in madrasas. Mela Yasîne Alikî has taught Sheikh İsmail Hezroyî, Muhammed Emin, Mela Muhmeme Yıldıırım, and many others. It is understood from the related section of Khazwetu Huneyn that Mela Yasîne Alikî belongs to the Alikî Nakhbend sect. Although we do not see traces of his sect in his work Xezwetu Huneyn, he mentioned his sect and sheikhs in his poems. So far, we have reached Alikî's 5 poems and Xezwetu Huneyn. Xezwetu Huneyn It is about the Battle of Huneyn, which took place during the reign of Muhammed.

Three manuscript copies of Alikî's Khazwetu Huneyn have been identified so far. Of the copies in question, the copy belonging to Yusuf Yaşar is wider and more comprehensive than the other two copies, the Muhammed Emin copy and the Mola Huseynê Botî copy.

Khawetu Huneyn is a verse of Caliph Ali's war story, this war story also includes extraordinary people and events as well as real events. The work in question has moved away from reality due to the extraordinary elements and events it contains and has gained a new dimension. In Khazwetu Huneyn, events and fiction regarding Prophet Muhammed and Chalip Ali are narrated together. Caliph Ali appears as the protagonist in the work in question. In the work, Caliph Ali is seen as a unique warrior and hero. So much so that winning the war It depends on the presence of Caliph Ali. Therefore, in the work, compositions and terms praising Ali and expressing his heroism are frequently encountered.

Although Mela Yasîne Alikî's work Khazwetu Huneyn is not written in the masnawî genre, there is an order similar to the masnawî genre and there are the introduction, main section, and concluding section in the work. Although these chapters are not determined by the author, the flow of the event and the layout of the text help to separate these chapters.

When we look at the language of the work, it is written in a simple and understandable language, and although it is composed of foreign languages and words, these do not aggravate the language. Alikî also used many dilemmas, idioms, and religious terms to increase the power of discourse. In Xezwetu Huneyn, the language features of Serhad and Behdinan dialects are also encountered. In addition, Mela Yasîne Alikî Khazwetu Huneyn included many vocabulary arts in his work and thus made his discourse even more attractive.

The work consists of a total of 373 verses, 27 of which are written as six and 346 as four. In other words, the work was not written in the same order from the beginning to the end and there are breaks in its arrangement. Although the work is mostly written in syllable size, the gazelle in it is written in aruz prosody size.

In general, the subject of this work was influenced by Mela Yasînê Alikî and he wrote this work about 90 years ago with a verse and a bee Kurmanci because he wanted such a war story to be in Kurdish. Although there are similar genres in Kurdish literature, this work of Alikî is very important in this regard since there are not many known numbers. In this study, Mela Yasînê Alikî's Khazwetu Huneyn will be introduced and the work will be examined in terms of shape and content.

Destpêk

Cengname ji bêjeya "ceng"ê ku tê maneya herb, şer û lihevixistinê û ji bêjeya "name"yê ku ew jî tê maneya nivîs û pirtûkçeyê pêk hatiye. Cengname jî ji wan pirtûkan re tê gotin ku behsa çîrokên şer dikin (Develioğlu, 2017: 150). Cengname li gor Jean-Louis Mattei jî ew cureya edebî ye ku bi awayê mibalexeyî û mucîzewî behsa bûyerên ku dê ti carî neqewimin dikin. Li gor Mattei bûyerên cengnameyan di navbera misilman, xiristîyan û kesên ku bawerî bi dîn neanîne diqewimin. Bi piranî bûyerên cengnameyan li derdora Hz. Muhammed (s.x.l.), Îmamê Elî, eshabeyan û kesên ku ji aliyê muellifan ve hatine afirandin, derbas dibin. Cengname ew berhem in ku bûyerên dîrokî di xeyalên nivîskaran de dirûv girtine û çêkirî ne. Lewra cengname ne weke bûyerên tarîxî rast in (Mattei, 2004: 18).

Li gor İsmet Çetin: cengnameyên Îmamê Elî ew metn in ku li dora qehremanî, mêrxasî, pehlewani û egîdiya Îmamê Elî hatine hûnandin. Ev cengnameyên Îmamê Elî ji sedsala 13em û pê ve li seheya Enadolê bi rêya tercume, adapte an jî bi rêya te'lîfê hatine nivîsîn (Çetin, 1997: XXX).

Di serî de Îmamê Elî û lehengên din di cengnameyan de kesên ku li ser soza xwe ne, comerd in, dest nadin tiştên ku heq nekirine, dest nadin kesên ku nan û xwarinên wan xwarine û li hemberî zaliman mezlûm parastine (Toprak, 2016: 9). Cengnameyên Îmamê Elî li ser wêrekî û mêrxasîya Îmamê Elî ne, di cengnameyan de Îmamê Elî lehengekî bêhempa ye û ti kes li hemberî wî nikare bisekine. Gava Îmamê Elî ne li meydanê be rewşa misilmanan xerab e, lê piştî ku Îmamê Elî tê meydanê misilman bi ser dikevin û muşrik anga dijmin têk diçin.

Dema ji aliyê ziman ve li cengnameyan tê nihêrîn tê dîtin ku zimanekî xwerû û zimanê gel di wan de xuya dibin. Cengname ji bo gel tene nivîsîn, lewra nivîskaran zimanekî sade di cengnameyan de tercîh kirine da ku bi hêsanî bê fêmkirin (Galotta, 1981: 474). Di nav zimanê cengnameyan de xusûsiyetên heyamên ku tê de hatine nivîsîn hene. Ji ber ku ev berhem metnên li ser şeran e bêje û peyvên ku bi şer û cengê re têkildar in jî tê de pir in. Herwiha ji ber ku berhemên dînî ne di wan de gelek têgehên dînî cih digirin (Atalan, 2011: 48).

Cengname bi şêwazeke edebî û bi awayekî mibalexe behsa şer û cengan dikin. Di cengnameyan de bûyer bi unsûrên derasayî yên weke cin, cadû, dêw û ejderha (Atalan, 2009: 17) hatine xemilandin û bi vî awayî ev berhem ji rastîyê dûr ketine. Ji ber ku di xwe de bûyerên derasayî û bûyerên ku dê ti carî neqewimin di hewînî jî xezenameyan vediqetin.

Dîroka Cengnameyan

Çavkanîyên cengnameyan ji têkoşînên serdemên ewil yên Îslamîyetê, Qur'an, hedîs, dîroka Îslamê (Toprak, 2016: 8; Atalan, 2011: 46) û ji pirtûkên dînî-exlaqî pêk tên (Çetin, 1997: 86). Di çandên Erebi, Farsi, Tirk (Gümüškılıç, 2013: 143; Demir, 2019: 1) û Kurdan de cureya cengnameyê tê dîtîn. Herwiha ev cure bi tesîra edebiyatên Erebi û Farisan derketiye holê (Mattei, 2004: 11; Demir, 2019: 6) û piştê ketine nav edebiyatên Tirk û Kurdan. Di edebiyata Farisî de ji cengnameyên ku behsa lehengî û serpêhatiya Hz. Elî dikin weke "xawername" hatine binavkirin. Di Farisî de Ibnî Husamê Xûsefî xawernameyek nivîsiye û Ibnî Husam di nivîsîna vê berhema xwe de ji berhemeke Erebi sûd wergirtiye û di sala 1426an de qedandiye. Berhema Husam ji 22.500 malikan pêk tê û tê de 155 minyatur cih digirin (Gür, 2022: 193).

Cureya cengnameyê di edebîyata Tirkî de cihekî girîng digire û gelek nimûneyên vê cureyê hatine dayîn. Di edebîyata Tirkî de ev cure bêtir ber bi Îmamê Elî ve hatiye nisbetkirin ango ew berhemên ku behsa egîdî, şervanî û pehlewaniya Îmamê Elî dikin weke cengname hatine binavkirin (Toprak, 2016: 9). Lê ev yek ji bo pênasikirina cengnameyê ne dirûst e, lewra ji bilî Îmamê Elî li derdora kesayetên din jî bi cureya cengnameyê berhem hatine dayîn. Wek mînak li derdora kurê Îmamê Elî, Muhemmed Henîfe, Hz. Hemze û hwd. jî cengname hatine nivîsîn.

Di edebîyata Tirkî de cara ewil cengname ji aliyê Tursun Fakih ve hatiye nivîsîn (Atalan, 2011: 46) û bi kesên weke Şeyyad Îsâ, Kirdecî Ali, Maazoğlu Hasan û Meddah Yusuf ve berdewam kiriye. Di edebîyata Tirkî de çî menzûm çî jî mensûr û çî jî mensûr-menzûm têkelhev bi dehan cengname li ser Îmamê Elî hatine nivîsîn (Çetin, 1997: 56-90). Hin ji wan cengnameyan ev in: Gazavât-1 Kîssa-1 Mukaffa' Hazret-i 'Alî Keremullah Veche Cengidûr, Kîssa-1 Kahkaha Gazavat-1 'Alî Keremullahu Veche, Gazavât-1 'Aremrem Bin Mûsallat Cengidûr Zeyd' in Göne Kaplandığıdur (Çetin, 1997: 1-6).

Li ser Cenga Huneynê hin berhem hene, lêbelê bi temamî ne di nav cureya cengnameyê de ne û beşek wan li ser vê cengê ye. Di metnên dînî-destanî yê weke siyer, destan û xezawetnameyan de jî behsa bûyera cenga Huneynê hatiye kirin. Di berhema bi navê *Sîretü'n Nebî* ya Muhemmed Efendî (s.s. 15.) de beşa bi navê *Bu Kîssa Huneyn Gazasîdur ve Peygamberün Hevazîn Begleriyle Ulu Cengidûr* li ser vê cenga Huneynê ye û bi Tirkî weke menzûm hatiye nivîsîn. Herwiha Mela Nûrullahê Godîşkî (w. 2003) jî di siyera xwe ya bi navê *El-Cewahîru'r-Reşadiye Fî Sîretî'n-Nebewiyyeyê* de beşek li ser cenga Huneynê bi Kurdîya Kurmancî û mmenzûm nivîsîye.²

1. Di Edebîyata Kurdî de Cengname

Di edebîyata Kurdîya Kurmancî de jî nimûneyên cengnameyan têne dîtin. Li gor daneyên li ber dest cureya cengnameyê cara ewil bi berhemên Borê Qer (Qewlê Hespê Reş) û Qewlê Newala Sîsebanê tên xuyakirin û herwiha ji bilî van berhemên navborî çend berhemên din hene. Yaşar Kaplan di pirtûka xwe de berhemên ku behsa Îmamê Elî, Hz. Umer, Hesen û Huseyn, Muhemmed Henefiye, Rustemê Zal, Hetem û Silêmanê Sindî dikin û Beyta Kekemirê û Beyta Sîsebanê jî weke cengname hesabandîye (Kaplan, 2019: 309). Xezwetu Huneyna Mela Yasînê Alikî jî ku bûye mijara vê xebata me dikeve nav cureya cengnameyê.

Di nav edebîyata Kurdî de hin destan hene ku mijara wan şer û pevçûn in. Weke Destana Kela Dimdimê û Derwêşê Evdî, Destana Rustemê Zal, Heft Xanê Rustem û hwd. Her çiqas destana Kela Dimdimê li ser şer hatibe hûnadin jî di nav cureya cengnameyê de nayê hesabandin. Lewra di cengnameyan de serlehengek heye û şer li derdora wî serlehengî dizivire. Ew serlehang bi hêz û cengawerîya xwe dijminan têk dibe. Dema li destana Kela Dimdimê tê mêzekirin têkoşîneke mezin ji bo kelehê tê dîtin. Her çiqas di destana Kela Dimdimê de şervanên Kurd bi cengawerî li hemberî Sefewîyan şer kirine jî di dawîyê de têk çûne û hemû mirine. Lêbelê di cengnameyan de serlehang birîndar bibe jî ti carî namire û di dawîyê de bi her awayî dijminan têk dibe. Ji xwe jî ber ku fokûsa cengnameyan bihêzkerina hêza ceng û cengawerîye ye nabe ku serlehang bimire û li hember dijminan têk biçê. Herwiha ji bilî Kela Dimdimê di destana Dewrêşê Evdî de jî ceng û cengawerîyê li pêş e, lê dîsa di vê destanê de jî berhem ne li derdora şer hatiye avakirin û di dawîyê de serlehangê destanê jî aliyê dijmin ve tê kuştin. Ji ber vê hindê destana Dewrêşê Evdî jî nakeve nav cureya cengnameyê.

Dem a li naverok û metna Heft Xanê Rustem û Destana Rustemê Zal (Vali, 2011; Çalışır, 2019) tê mêzekirin tê dîtin ku ji aliyê vegotin û şewazê ve dişibin cengnameyê, lê ji cengnameyên Îmamê Elî vediqetin. Çûnkî di cengnameyên Îmamê Elî de teblîxkirina dînê Îslamê xala sereke ye ango cengnameyên ku li dor şervaniya Îmamê Elî tene hûnandin ji bo teblîxkirin û belavkirina dînê Îslamê ne.

² Agahiyên zêdetir ên derbarê metnên dînî-destanî de bnr. (Bişaroğlu, 2022: 2-23).

Li gor ku Cegerxwîn di helbesteke xwe de destnîşan dike Melayê Xasî (1866-1951) jî Cengnameya Kurd û Ermenan nivîsiye. Lê ji bilî helbesta Cegerxwîn di ti cihî de behsa vê cengnameyê nehatiye kirin (Cegerxwîn, 2014: 151-153).

Di edebîyata Goranî (Hewramî) de jî cureya cengnameyê hatine tesbîtkirin. Di edebîyata Goranî de heta niha sê cengname hatine tesbîtkirin. Cengnameya Elî Mîrzayê Kerendî bi Goranî hatiye nivîsin. Ev cengname di sala 1246ê hicrî (1831ê mîladî) de ji bo fermandarê leşkerên Goran Mehdî Xanê kurê Melîk Nîyazî hatiye nivîsin. Kesê ew îstîsax kiriye navê wî Mela Elî ye. Ev Cengnameya Elî Mîrzayê Kerendî bi teşeya mesnewîyê hatiye nivîsin û ji 355 malikan pêk hatiye û li ser şeş serenavan hatiye nivîsin. Ev cengname li ser şerê Qecer û Osmanîyan ango Îran û Osmanîyan disekine. Di vê cengnameyê de Kurdên Goran ku Yarisanî ne di şer de terefdarîya dewleta Îranê kirine. Di vê cengnameyê de bêtir şerê ku di navbera mezhebên Şîî û Sunnîyan de ye li pêş e (Özçoşar & Vali, 2017: 269-271).

Du cengnameyên Goranî jî li ser cengên serdema Hz. Muhemmed (s.x.l.) radiwestin. Ji wan yek bi navê Fetha Xeyber e û ya din jî bi navê Xezewata Bedir û Huneynê ye. Nivîskarên van her du berheman jî hêj nehatine tesbîtkirin, ji van berheman mustensîxê Fetha Xeyberê Seyîd Nûrî ibnî Şêx Ebdurrehmanê Azebanî ye û di sala 1266ê Qemerî (1849 mîladî) de hatiye nivîsin. Xezewata Bedir û Huneynê di sedsala 14ê Qemerî (sedsala 19.ê mîladî) de hatiye nivîsin.³ Ev cengnameyên bi Goranî berîya berhema Mela Yasînê Alikî hatine nivîsin.

Mela Yasînê Alikî alim û peyrewê terîqeta Neqşebendîya Xalidî bûye. Mela Yasîn li ser Cenga Huneynê (630) ya ku di dewra Hz. Muhemmed (s.x.l.) de pêk hatiye berhema xwe ya bi navê Xezwetu Huneyn nivîsiye. Mijara vê xebatê analîz û danasîna Xezwetu Huneyn a Mela Yasînê Alikî ye. Çarçoveya xebatê jî ligel kurtejiyana Mela Yasînê Alikî dê bi berhema wî ya bi navê Xezwetu Huneynê ve sînardar be. Ev berhema ku bûye mijara vê xebatê mehsûleke çanda dînê Îslamê ye û berhemeke menzûm a dînî-edebî ye.

Armanca vê xebatê danasîna vê berhema Mela Yasînê Alikî ye. Ji ber ku di edebîyata Kurdî de berhemên bi cureya cengnameyê kêmtir in, ji vî alîyî ve ev berhema Mela Yasînê Alikî girîng e û ev berhem bi hindikî be jî dê vê valahîyê kêmtir bike.

2. Mela Yasînê Alikî (1891/1901-1976) û Xezwetu Huneyna Wî

Derbarê jiyana Mela Yasînê Alikî (Yasin Çelebi) de malûmatên zêde tune ne. Navê bavê wî Hecî Mela Ebdullah (1864-?)⁴ û yê diya wî Heyat (1897-?) bûye. Dîroka çêbûna Mela Yasîn ne zelal e. Lewra di kutuka malbatê de çêbûna wî weke 1891 hatiye tomarkirin û li ser kêlên gora wî jî bi hicrî 1317 (1901) hatiye nivîsin. Cihê jidayikbûna wî weke gundê Zomika Panosê tê zanîn.

Mela Yasîn carekê zewicî ye û ji vê zewacê heft zarokên wî çêbûne, ji van zarokan çar kur û sê jî keç in. Mela Yasîn di sala 1976an de li Panosa Agirîyê wefat kiriye.

Mela Yasîn hêj di biçûkatîya xwe de dest bi tehsila ilmên dînî kiriye. Mela Yasîn li ber destê Feqe Reşîdê Alikî (w. 1932) dest bi perwerdeya xwe kiriye û li cem kesên weke; Mela Zahirê Memanî (w.1966), Mela Qasim (Melayê Pozreş, w. 1967), Şêx Nesîmê Kufrewî (w. 1950), Şêx Muhemmedê Erwasî (w. 1957), Şêx Ebdulhekîmê Bîlwanîsî (w. 1972) û li cem Mela Ehmedê Kurumzade (w. ?) xwendîye û îcaze wergirtiye.

³ Xebata neçapbûyî: (Karak & Zadesafarî, Du Cengnameyên Goranî)

⁴ Mela Ebdullah di sala 1864an da li Erdîşa Wanê hatiye dinê û sala mirina wî nayê zanîn.

Mela Yasînê Alikî piştî ku perwerdeya xwe xelas kiriye dest bi dersdayîn û muderisîyê kiriye. Mela Yasînê Alikî jî alimê heyama xwe bûye û dersên weke mentiq, adab, nîqaş, belaxat, îstîfare, vadi', fiqîha Şafî, tesewûf, Mînhac, ilmên kelimê, Fethu'n-Nûnî, Eqaida Neseffî, hedîs û tefsîrê dane (Çetin, 2020: 111). Mela Yasînê Alikî ders daye kesên weke; Şêx Îsmailê Hezroyî (Îsmail Çetin, w. 2011), Muhemmed Yıldıırım (ç. 1944-), Seyid Ebdulbaqî Erol, Seyid Salih, Kemalê kurê Îbrahîmê Şewê, Seyid Îzzettîn û Feqe Mecîd û Mihemmed Emîn.

Mela Yasînê Alikî peyrewê terîqa Neqşebendîya Xalidîyê bûye û di medreseyan terîqetê de perwerdeya tesewûfî wergirtiye. Mela Yasînê Alikî jî postnişînê dergeha Kufreyê ji Şêx Nesîmê Kufrewî û ji dergeha Xeydayê jî ji Şêx Muhemmed Hafîdê Erwasî îcazeya xelîfetîyê wergirtiye (Çetin, 2020: 40-111; Bişaroğlu, 2022: 350-359).

Herwiha ji îfadeya “Yasîn bîn Mola Ebdullah el-Alikî el-Xalidî el- Neqşî” jî tê fêhm kirin ku ew peyrew terîqeta Neqşebendîya Xalidî bûye (Bişaroğlu, 2022: 347).

Mela Yasînê Alikî ji eşîra Alikan e û wî navê eşîra xwe “Alikan” di berhema xwe de weke mexles jî bi kar aniyê. Heta niha pênc helbest û berhema wî ya bi navê Xezwetu Huneynê hatine tesbîtkirin (Bişaroğlu, 2022: 26-60).

2.1. Xezwetu Huneyn

Berhema Mela Yasîn a bi navê Xezwetu Huneyn (Cengnameya Îmamê Eli) behsa cenga Huneynê dike ku di serdema Hz. Muhemmed (s.x.l.) de pêk hatibû. Berhem bi awayekî menzûm e û heta niha 3 nusxeyên wê yê destxet hatine dîtin. Nusxeya sereke bi tevahî 61 wêrege ye. Herwiha metna rexneyî ya Xezwetu Huneynê jî ji 373 bendan pêk hatiye û ev bendên wê ji 346 çarîne û ji 27 şeşîneyan pêk hatiye. Berhem bi Kurdîya Kurmancî ye. Her çiqas tê de bêje, peyv û terkîb ji zimanên biyanî weke Erebî, Farisî û Tirkî hebin jî ev yek zimanê berhemê giran nekiriye û metna berhemê bi hêsanî tê fêmkirin. Dema li cengnameya Mela Yasînê Alikî tê mêzekirin tê de kêşa erûzê û ya xwemalî tèn dîtin. Metna berhemê bi piranî bi kêşa birgeyî hatiye nivîsîn û kêşa erûzê tenê di xezelekê de ku di nav metna cengnameyê de ye hatiye bikaranîn.

2.1.1. Nusxeyên Xezwetu Huneynê

Heta niha sê nusxeyên destxet ên Xezwetu Huneyna Mela Yasînê Alikî hatine tesbîtkirin. Derbarê van nusxeyên berdest de agahiyên hewce li jêr hatine dayîn û bi kurtasî hatine danasîn. Ev nusxe bi navên Nusxeya Yûsif Yaşar, Nusxeyê Muhemmed Emîn û Nusxeya Mela Huseynê Botî ne û nimûne ji van nusxeyan di pêvekan de hatine dayîn (Bnr. Pêvek: 1,2,3,4,5).

2.1.1.1. Nusxeya Yûsif Yaşar (NYY)

Mustensîxê vê destxetê ne dîyar e û ev nusxe li cem malbata Yûsif Yaşar tê parastin. Me ev nusxe bi rêya Abdurrahman Adak ji nevyê Yûsif Yaşar ji Taha Yaşar wergirt. Nusxe destxet e û ji 61 wêregeyan pêk tê û bergê nusxeyê kesk e û bi çermekî cildkirî ye.

Li gorî benda duyem ya metna cengnameyê ya di nusxeya Yûsif Yaşar de ev berhem di sala 1934an de hatiye nivîsîn.⁵

Ji hicreta Resûlê Heq
Hezar sê sed ku derbaz bû
We pêncî sê bikin lahiq
Ji bo vê nezmê tarîx bû⁶

⁵ Lê li gorî talebeyê Alikî, Muhemmed Emîn jî Alikî ev berhema xwe di sala 1930yê de nivîsiye. Bnr.: Pêvek: 5.

⁶ 1353yê hicrî beranberî 1934ê miladî tê. Li gorî agahiyên di vê bendê de tê fêmkirin ku ev metn di vê dîrokê de hatiye nivîsîn.

Di metnê de li ser nivîsên di destxetê de midaxale hatine kirin, lewra ji ber ku bi demê re hibra resen jê çûye bi pênuşeke şîn li ser hibrê hatiye derbaskirin. Yanî bi destekî dinê hin cihê wê dîsa hatine nivîsîn. Di destxetê de derheqê dîroka îstînsax, xwedî û cihê îstînsaxê de agahî nînin. Lê hin nivîsên Erebi ji aliyê malbata Yusuf Yaşar ve lê hatiye nivîsîn û ev berhem weke ya Mela Yusuf be hatiye qeydkirin. Herwiha di cihên ku mexles tê de derbas dibin midaxale çêbûne û navê “Yasîn” jê hatiye birin û ji dêvla “Yasîn” navê “Yusif” hatiye nivîsîn. Lê dîsa jî navê “Yasîn” di bin de tê xuyakirin.

Wereqên vê destnivîsê hatine reqemkiririn, lê di hemû rûpelan de reqem cih nagirin. Ji rûpela 5an pê ve li destxetê reqem hatine dayîn. Di vê destxetê de di dawîyê de helbesteke⁷ bi Tirkîya Osmanî cih digire. Di vê nusxeyê de tenê 15 malikên vê helbestê hene.

2.1.1.2. Nusxeya Mihemmed Emîn (NME)

Mustensîxê vê nusxeyê Mihemmed Emînê kure Xelîfe Hecî Ehmedê ji eşîra Milan e û ji gundê Erûsê⁸ ye. Li gorî agahiyên ku di dawîya nusxeyê de hatiye dayîn Mihemmed Emîn li gundê Şîwekarê⁹ talebeyê Mela Yasîn bûye û jê ders wergirtiye. Malûmatên derheqê Mihemmed Emîn de li ber destên me kêmtir in. Mustensîx di vê nusxeyê de Mela Yasînê Alikî weha daye nasîn; “Yasîn bin Molla Ebdullah el-Alikî el-Xalidî el- Neqşî”. Li gorî agahiyên ku di rûpela dawî de hatine dayîn ev berhem di sala 1349an (1930ê Miladî) de ji aliyê Mela Yasînê Alikî ve hatiye nivîsîn û herwiha di sala 1379an (1959ê Miladî) de ji aliyê Mihemmed Emîn ve hatiye îstînsaxkirin.¹⁰ Me ev nusxe ji keça Mela Yasînê Alikî ji Husna Ataseven wergirt û ev destxet niha li cem me ye.

Nusxe destxet e û ji 22 wereqeyan pêk hatiye û 44 rûpel e û herwiha bergên wê tune ne. Di vê nusxeyê de rûpel nehatine nimarekirin. Metna berhemê ji rûpela ewil dest pê dike û heta rûpela 26an dewam dike. Rûpelên di navbera 27 û 43yan de vala ne û di rûpela dawî ya 44an de tenê hevokê cih digire.

2.1.1.3. Nusxeya Mela Huseynê Botî (NMH)

Ev nusxe ji aliyê Mela Huseynê Botî ve hatiye îstînsaxkirin. Mela Huseynê Botî di sala 1927an de li gundê Binêrvê¹¹ ku girêdayî Erûha Sêrtê ye çêbûye. Li çendîn gundê Panosê melatî kiriye. Helbestên wî yê Kurdî ku nehatine çapkirin hene. Mela Huseynê Botî zavê Kamilê kurê Feqe Reşîdê Alikî ye. Di sala 1999an de li Axtêpe¹² ya ku girêdayî Panosêye rehma kiriye (Reşîd, 2020: 17-18). Mela Huseyn di sala 1954an de ev berhema Xezwetu Huneynê îstînsax kiriye.

Hemû nusxe niha li ba Mela Nezîf Katılmışê kurê Mela Huseynê Botî ye. Ji vê nusxeyê 5 rûpel di destê me de ye û ji ber ku hemû nusxeyê ne li cem me ye malûmatên derheqê nusxê de jî kêmtir in. Li gorî agahiyên ku me bi dest xistine, di nusxeyê de di cihên mexlesê de nivîs hatiye texrîbkirin û navê Feqe Reşîd weke mexles lê hatiye zêdekirin. Li gorî Mela Nezîf Katılmış û malbata Feqe Reşîdê Alikî ev berhem ne ya Mela Yasînê Alikî ye û ya Feqe Reşîd e. Lê di temet û rûpelên li ber destê me yê vê nusxeyê de îbareteke ku em bibêjin ev berhem ya Feqe Reşîd e tune ye. Herwiha di her du nusxeyên ku di destê me de ne ev berhem bi zelalî weke ya Mela Yasînê Alikî xuya dike û di van her du nusxeyan de ku bi temamî li ber destên me ne, tenê mexlesa Mela Yasînê Alikî heye. Bi heman

⁷ Ev helbesta ku di dawîya nusxeya Yusuf Yaşar de derbas dibe a kesekî bi navê Bilal Nûrî ye. Helbest bi tevahî 51 malik e. Di nusxeya li ber destê me de jî tenê 15 malik cih digire. Ji bo agahiyên berfirehtir derheqê helbestê de bnr: (Sarıkaya, 2012: 113-145).

⁸ Bi navê Erûsê (Yolüstü) gundekî Xinisa Erziromê jî heye. Îhtimal e ku heman gund be.

⁹ Bi Tirkî navê wî gundî “Ovapınar” e û girêdayî navçeya Bêgirî (Muradiye) ya Wanê ye.

¹⁰ Ji bo agahiyên nusxeyê bnr.: Pêvek: 4-5.

¹¹ Bi Tirkî navê wî gundî “Emekçiler” e.

¹² Bi Tirkî navê wî gundî “Aktepe” ye.

awayî mustensîxê nusxeya NMEê ku talebeyê Mela Yasînê Alikî ye, di nusxeya xwe de dibêje nazimê (muellîf) vê berhemê Mela Yasînê Alikî ye. Ji ber van delîlan em jî vê berhemê weke ya Mela Yasînê Alikî qebûl dikin.

3. Vekolîna “Xezwetu Huneyn”a Mela Yasînê Alikî

Mela Yasînê Alikî di berhema xwe de navê berhemê rasterast nenivîsî ye. Lê di serê nusxeya bingeha xebatê (Nusxeya Yusif Yaşar) de ku nusxeya herî berfireh e îfadeya “Xezwetu Huneyn” hatiye nivîsîn û di nav metnê de jî hin bêje û bendên ku nav û naveroka vê berhemê bi bîr tînin hatine bikaranîn. Ji îfadeya Xezwetu Huneynê ku di serê destxetê de cih digire tê fahmkirin ku navê vê berhema Alikî Xezwetu Huneyn e. Herwiha Alikî di nav berhema xwe de jî bo cengê îfadeyên weke “Huneyn, Cenga Huneynê, Roja Huneynê” jî bi kar anîne. Weke ninûme:

Ji hedîsan dikir ixrac
Beyan kir Cenga Huneynê
Bi Kurmancî wî kir idrac
Ku du’an bo wî bixwînin

3.1. Cureya “Xezwetu Huneyn”ê

Metna berhema Xezwetu Huneynê ku bûye mijara vê xebatê ji aliyê teşe û naveroka xwe ve dikeve çarçoveya menzûmeyan.

Metnên menzûm ên ku di dîwanan de cih nagirin bi awayekî serbixwe hatine nivîsîn wek menzûme tînin binavkirin. Dikare bê gotin di edebîyata klasîk de kurt be yan dirêj be, teşeya wê ya nezmê mesnewî be, yan tiştêkî dî be ferq nake hemû metnên edebî yên ku derveyî dîwan, dîwançe û mecmû’eyan dimînin dikevin kategoriya menzûmeyê. Ji aliyê teşeyên nezmê ve menzûme li ser du kategoriyan dikare bê dabeşkirin: Yên ku bi teşeya mesnewîyê hatine nivîsîn û yên ku bi teşeyên dî hatine nivîsîn. Divê bê gotin di menzûmeyan de herî zêde teşeya mesnewîyê hatiye bikaranîn. Memzûme ne di mijarên lirîk de bi piranî di mijarên dîni, dîrokî, dîdaktîkî û exlaqî de tînin nivîsîn (Adak, 2019: 93-94).

Nêzîkbûna cureyên edebî ya ji aliyê mijarê ve bûye sedem ku lêkolerên edebîyatê jî bi temkîn tevbigerin û têgehên giştî bi kar binin. Ji bo tesnîfa cureyê edebî navê berhemê tîr nake. Lewra tîr dîtin ku di hin berhemên de navên cureyan jî dêvla hevûdu hatine bikaranîn. Ji ber vê yekê bi nêrîna li navê menzûmeyê tesbîtkirina cureya wê her tim encameke rast nade (Aça & Gökalp & İsa, 2012: 293-294). Di edebîyata klasîk de di mijara navdayînê de xezaname û cengname di nav wan cureyan de ne ku tîne tevlihev kirin (Koyuncu, 2020: 137).

Her çiqas Mela Yasînê Alikî di serê berhema xwe de bi mebesta navê berhemê îfadeya Xezwetu Huneyn bi kar anîbe jî ev berhem nabe xezanameyek. Ev berhema Mela Yasînê Alikî li ser “Cenga Huneynê” hatiye nivîsîn û şer û bûyer li derdora Hz. Muhemmed (s.x.l.) û Îmamê Elî diqewimîn. Di edebîyata Tirkî de ev berhemên ku mîrxasîya Îmamê Elî tînin ziman weke “Cengnameyên Hz. Elî” hatine binavkirin. Cureya berhemên li gor naveroka wan tînin dîyarkirin û ji ber ku ev berhema menzûm Xezwetu Huneyn jî li ser şervanî û cengê ye û di xwe de unsûrên derasayî vedihewîne dikeve nav cureya cengnameyê. Bi taybetî di cengnameya Alikî de behsa pehlewani, qehremani, şervanî û mîrxasîya Îmamê Elî tê kirin û berhem bi unsûrên derasayî hatiye xemilandin. Ji ber van egerên li jor û ji naveroka berhemê derdikeve holê ku cureya vê berhemê cengname ye û me jî ev berhem ji aliyê cureyê ve weke “Cengnameyeke Îmamê Elî” qebûl kir. Di berhemê de di çend cihan de bêje û peyvên weke ceng, Cenga Huneynê, şer û herb derbas dibin.

Ji hedîsan dikir ixrac
 Beyan kir Cenga Huneynê
 Bi Kurmancî wî kir idrac
 Ku du'an bo wî bixwînin
 ...
 Kafîr Islam carek
 Ser û binê hev bûn
 Navê Heq mubarek
 Temam li hev qam bûn
 Wan şer kirin qasek
 Serî l' 'erdê hol bûn

3.2. Teşeya "Xezwetu Huneyn"ê

Di edebîyata Tirkî de çî menzûm çî jî mensûr û çî jî mensûr-menzûm têkelhev bin, gelek cengname li ser Îmamê Elî hatine nivîsîn (Çetin, 1997: 90). Li gorî Îsmâil Çetin Cengnameyên Îmamê Elî bi teşeya mesnewîyê ne û gava ku li gorî kêşa erûzê têne nixandî, tê dîtî ku di wan de kêşeke biqisûr û netekûz heye. Ji ber vê yekê jî ev berhem li gorî kêşa birgeyî ango kiteyî werin nixandî de rasttir be. Li gorî Çetin cengname bi kêşa birgeyî hatine nivîsîn (Çetin, 1997: 97-98).

Di edebîyata klasîk de li gorî tercihên helbestvanan gelek teşeyên cîyawaz derketine meydanê. Hejmara bendan, pîvan û şemaya serwayê li gorî terciha helbestvanan ji hev guherîne. Ev yek jî "Teşeyên Bipergal ên Wekhev" û "Teşeyên Bipergal ên Tevlîhev" derxistine holê (Aça & Gökalp & Kocakaplan, 2012: 132). Dema li cengnameya Mela Yasînê Alikî tê mêzekirin tê dîtî ku cengnameya wî dikeve bin banê her du teşeyan ango xisûsiyetên van her du teşeyên navborî jî di xwe de vedihewîne.¹³

Li gorî Çetin di tertîba van Cengnameyên Îmamê Elî de ku bi teşeya mesnewîyê ne di bin beşa destpêkê de bi piranî qismên tewhîd, munacat, ne't, mîr'ac, mu'cizat, medhê Çaryar, medh û sebebê te'lîfê cih digirin û beşa mijara sereke û beşa encamê jî di van cengnameyan de hene (Çetin, 1997: 98-117).

Berhema Alikî bi bendan hatiye nivîsîn û ev menzûme ji 346 çarîne û ji 27 şeşîneyan pêk hatiye û bi tevahî ji 373 bend in. Berhema Alikî her çiqas bi bendan hatibe nivîsîn jî ev beş û qismên ku Çetin behs dike hin ji wan di Xezwetu Huneynê de jî hene. Ev berhem ji aliyê teşeya nezmê ve weha dikare bê nixandî.

3.2.1. Tertîba "Xezwetu Huneyn"ê

Îsmet Çetin ji bo Cengnameyên Îmamê Elî yê ku bi teşeya mesnewîyê hatine nivîsîn dibêje di bin beşa destpêkê de bi piranî qismên tewhîd, munacat, ne't, mîr'ac, mu'cizat, medhê Çaryar, medh û sebebê te'lîfê cih digirin û beşa mijara sereke û beşa encamê jî di van cengnameyan de hene (Çetin, 1997: 98-117). Tê dîtî ku di cengnameya Mela Yasînê Alikî de ku bi teşeya mesnewîyê nehatiye nivîsîn, lêbelê ev beş bi piranî cî digirin. Di vê menzûmeya Alikî de ev beşên cengnameyê weha ne:

3.2.1.1. Dîbace

Nivîskar di mesnewîyan de bi piranî li gorî qaîde û standartekê berhema xwe dinivîse. Mesnewînûs bi beşa dîbaceyê dest bi mesnewîya xwe dike û di vê beşê de berî her tiştî cih dide "besmele"yê ku destpêkirina bi navê Xwedê îfade dike. Di beşa dîbaceyê de gelek mijar cih digirin, ev mijarên ku di beşên dîbaceyên mesnewîyan de cih digirin ev in: Tewhîd, munacaat, ne'et, medhiye û sebebê te'lîfê (Adak, 2019: 268).

¹³ Derbarê teşeyê û serwabendiya vê berhemê de ji bo agahiyên zêdetir bnr.: (Bişaroğlu, 2022: 92-95).

Mela Yasînê Alikî di berhema xwe de di beşa dibaceyê de cih daye sê serenavan. Serenava ewil “Ya Ellahû Te’ala Bismillahirrehmanirrehîm” e. Piştî vê serenavê ayetên sûreya Tewbeyê tîn. Piştî vê serenavê, serenava duyem “Xezwetu Huneyn Bimennîhî Te’ala” ye. Ev serenav ji benda yekem dest pê dîke û heta benda 10an dewam kiriye. Helbestvan di bin vê serenavê de dest bi berhema xwe kiriye.

Serenava sêyem, “Hemd Selewat Piştî Bismillahê” yê. Ev serenav ji benda 11an dest pê dîke û heta benda 112an dewam dîke. Di bin vê serenavê de hem dibaceya cengnameyê cih digire hem jî hin bendên beşa sereke hene.

Nivîskarê Xezwetu Huneynê Mela Yasînê Alikî di beşa ewil a berhema xwe de behsa çavkanîyên ku jê sûd wergirtiye kiriye. Alikî tîne ziman ku wî berhema xwe bi agahîyên ku ji ayet, hedîs û rîwayetan hatiye wergirtin nivîsiye. Çavkanîyên xwe di dibaceya berhemê de weha tîne ziman:

Ji hedîsan dikir ixrac
Beyan kir Cenga Huneynê
Bi Kurmancî wî kir idrac
Ku du’an bo wî bixwînin

Eger Kurmancî mewzûn bû
We nîne bê hedîs ayet
Yasîn perwanê narê bû
Beyan kir hal û ehwalat

...
Rawî kir rîwayet
Bi delîl û ayet
Yasîn kir hikayet
Ewha kir dirayet

3.2.1.2. Besmele

“Besmele” navê kurt ê ayeta “Bismillahirrehmanirrehîm”ê ye ku tê wateya “Bi navê Xwedayê ku Rehman û Rehîm e dest bi karê xwe dikim.” Wek taybetîyeke çanda Îslamê hemû karên girîng bi zikirkirina navê Xweda tîn destpêkirin û ji bo vê jî berî wan karan besmele tê kişandin (Adak, 2019: 273-274). Di Xezwetu Huneynê de besmele du caran derbas dibe, lê ne weke beşeke mistaqîl. Cara ewil besmele di serê berhemê de “Ya Ellahû Te’ala Bismillahirrehmanirrehîm” derbas dibe û paşê ayeta 25an ya sûreya Tewbeyê hatiye nivîsîn. Cara duyem jî besmele di bin serenava “Hemd Selewat Piştî Bismillahê” de derbas dibe. Di vê berhemê de di navbera her du besmeleyan de helbestvan sebebê telifê anîye ziman. Benda ku tê de “Besmele” cih digire weha ye:

Ewwil bismillahî
Elhemdulillahî
La’îq Padişah î
Bê mesken û cah î

3.2.1.3. Tewhîd

Di edebîyata klasîk de çî menzûm, çî pexşan hemû metnên edebî yên ku di wan de li ser yekîtiya Xwedê, sîfet û mezinahîya wî tê rawestan wek tewhîd hatine binavkirin. Tewhîd di dibaceyên mesnewîyan de bi teşeya mesnewîyê tîn nivîsîn (Adak, 2019: 278). Di metna Xezwetu Huneynê de jî beşa tewhîdê di navbera bendên 11 û 17an de ye. Benda ewil û ya dawî weha ne:

Ewwil bismillahî
Elhemdulillahî
La'iq Padişah î
Bê mesken û cah î

...
Wê herne dîwanê
Paş wezna mîzanê
Şa bin bi ihsanê
Li ehlê îmanê

3.2.1.4. Sebebê Te'lîfê

Di berhema Alikî de beşeke bi navê “Sebebê Te'lîfê” weke serenav tune ye. Lê di destpêke de helbestvan sebebê nivîsandina Xezwetu Huneynê weha anîye ziman:

Ji hedîsan dikir ixrac

Beyan kir Cenga Huneynê
Bi Kurmancî wî kir idrac
Ku du'an bo wî bixwînin

Eger Kurmancî mewzûn bû
We nîne bê hedîs ayat
Yasîn perwanê narê bû
Beyan kir hal û ehwalat

Bikin hemd û sena'ê Heq
Dîgel wî jî selewatan
Bidin ser wî Resûlê Heq
Bi 'ededê zerreyatan

3.2.1.5. Dîroka Te'lîfê

Di nusxeya NYYê de bi hesabê ebecedê dîroka nivîsîna berhemê bi hicrî 1353 (1934 Miladî) weke menzûm hatiye nivîsîn. Lê eşkere nîne gelo di vê tarîxê de nivîskar dest pê kiriye an xelas kiriye. Herwiha di nusxeya NMEyê de di beşa temetê de dîroka nivîsandina berhemê weke 1349an (1930ê Miladî) hatiye nivîsîn û sala îstînsaxa nusxeyê jî weke 1379an (1959ê Miladî) hatiye nivîsîn.¹⁴ Ji ber ku di her du nusxeyan de du tarîxên cuda hatine nivîsîn bi awayekî teqez tarîxa nivîsandina vê berhemê nayê zanîn, lêbelê li gor qenaeta me ev berhem di salên 1930yî de ji aliyê Mela Yasîne Alikî ve hatiye nivîsîn. Benda ku tarîx tê de derbas dibe weha ye:

Ji hicreta Resûlê Heq
Hezar sê sed ku derbaz bû
We pêncî sê bikin lahiq
Ji bo vê nezmê tarîx bû

¹⁴ Di beşa temetê ya nusxeya NMEyê weha derbas dibe: “Tarîxu'n-nezmi fî sene 1349 (1930) nazime Yasîn Bîn Ebdullah el-Alikî. Ketebe Muhammed Emin İbnî Xelîfe Hacı Mela Ehmed min eşîret Milanî 'Erûsî sakînî qurîyet’”. Bnr.: (Bişaroğlu, 2022: 347).

3.2.1.6. Mijar (Beşa Sereke)

Beşa sereke, beşa herî berfireh a mesnewîyê ye ku tê de mijara bingehîn a mesnewîyê bi hûrgulî tê pêşkêşkirin. Di tertîba mesnewîyê de beşa sereke piştî dibaceyê û berî xatîmeyê cih digire (Adak, 2019: 310-311).

Di Xezwetu Huneynê de tê dîtin ku ev beş di navbera bendên 20em û 369an de cih digire. Lê helbestvan beşa sereke di bin 13 serenavan de dabeş kiriye. Serenavên cengnameyê bi Erebbî, Farisî û Kurdî hatine nivîsîn. Serenavên ku di beşa sereke de derbas dibin bi mijara naverokê re eleqedar in. Ango di wan bendan de behsa çî dê bê kirin ji serenavan diyar dibe. Serenavên beşa sereke ev in: “Weznehu Ela Derbeyne”, “Werne Serê Hikayetê”, “Gazîya ‘Ebbas e ji bo Mu’minan”, “Sû’ê Qesda Kirî Şeybe ye li Hebbîbê Xuda”, “Kafirê di Pûsîyê da Qir Dikin Cabê Didine Pêxember”, “Fezil Binî ‘Ebas bi Be’se’l-Nebî”, “Gofte’ê Yasîn fi Heqî Mu’cizati’l-Mustefa”, “Gotina Cebra’îl ji Hebbîbê Xuda ra Mizgînîya Herbê”, “Pêxember Tehrîs Dike Mu’minan li Cihadê bi Wesfê Cennetê Hûrîyan”, “Lafkirina Sebe’e di Muqabilê Islamê û Hem Qetilkirina Wî”, “Qetilkirina Sebî’ed e”, “Wel-‘elîyu Kane Mu’ciz’en-Nebî Sallallahû ‘Eleyhî We Sellem”, “Xîtamu’l-Herb we Xelebetu’l-Îslam ‘ele’l-Kafir We’s-Selam”. Benda ewil û ya dawî yên beşa sereke ya Xezwetu Huneynê weha ne:

Rawî kir riwayet
Bi delîl û ayet
Yasîn kir hikayet
Ewha kir dirayet
...
Ku ew hatne îmanê
Temam şa bûn reqîsîn
Berî dane Medîne
Yasîn tamam nivîsî[n]

3.2.1.7. Xatîme

Beşa xatîmeyê ya mesnewîyan, beşa xilaskirin û dawîlêanîna mesnewîyê ye (Adak, 2019: 315). Alikî di vê beşê de ji bo xwe û ji bo dê û bavê xwe efûkirin xwestiye û ji pêxember re jî seywat xwestine û bi vî awayî dawî li berhema xwe aniye.

Ya Reb ehlê îmanê
Bi cennetê şa bikî
Wan dûr bikî j’ şeytanê
Cemalê nesîb bikî

Hem **Yasînê** gunehkar
Digel wî da û baban
Ger ‘efû kî ya Xeffar
Rehma te nabit nuqsan

Selewat bidin bira
Hûn xilas bin nîranê
Li Muhemmed aşkera
Şefî’ roja mîzanê

Hem digel wî fatihe
Ji sehabiyê kiram

Bi ezmanek fesîhe
Ji umetê ra tamam

3.2.2. Kêş, Serwa û Paşserwa

Dema li Xezwetu Huneyna Alikî tê mêzekirin tê dîtin ku di berhemê de kêşên erûzê û xwemalî hatine bikaranîn. Kêşa erûzê tenê di xezeleke di nav metna Xezwetu Huneynê de hatiye bikaranîn û ji bilî helbestê hemû berhem bi kêşa birgeyî hatiye nivîsîn.

Di Xezwetu Huneynê de bi piranî kêşên 6, 7 û 8 kiteyî hatine bikaranîn. Lêbelê di hin bendan de ew pergal xerabûye û bend di nav xwe de her risteyek bi kiteyeke cuda ango bi dirêjahîyeke cuda hatiye nivîsîn. Di hin bendên cengnameyê de ji aliyê kêşa birgeyî ve hevşengî di nav risteyên wê de tune ye, lê serwaya wê heye.

Di Xezwetu Huneynê de serwayên weke serwaya mucerred, serwaya murekkeb (serwaya murdef, serwaya muqeyyed, serwaya muesses) û serwaya cînas hatine bikaranîn. Herwiha di metna cengnameyê de di dawîya risteyên bendan de paşserwa jî hatiye bikaranîn. Serwa û Paşserwa hêzeke melodîk daye metnê û jiberkirina metnê xurttir kiriye.

3.3. Ji Aliyê Naverokê ve Xezwetu Huneyn

Cenga Huneynê di 8ê hîcra pêxember de di meha Şewwalê de (27 Kanûna Paşîn 630) li gelîyê Huneynê diqewime û navê herba Huneynê ji vî gelîyê tê (Duisenov, 2011: 11). Gelîyê Huneynê li aliyê rojhilatê Mekkeyê ye û jê 30 kilometre dûr e, di navbera Mekke û Taîfê de ye (Şulul, 2015: 572). Cenga Huneynê yek ji wan herban e ku di Qur'anê de behsa wê hatiye kirin. Ev herb weke herba Huneynê, Hewazînê û Ewtasê hatiye binavkirin (Şulul, 2015: 572).

Kurteya Cengnameyê: Ev cengname li ser Herba Huneynê ye ku di sala 630yê Mîladî de di navbera misilman, qebîleyên Hewazîn û Seqîfûnê de pêk hatiye. Di dawîya vê herbê de misilman bi ser dikevin û pûtperestên qebîleyên Hewazîn û Seqîfûnê têk diçin.

Piştî ku Mekke ji aliyê misilmanan ve tê fetihkirin begê qebîleya Hewazînê Malikê kurê 'Ewf vê xeberê dibihîse. Şeytan di dirûvê mirovekî kal de tê cem Malik û begên din û ji wan re dibêje ku Hz. Muhemmed Mekkê fetih kiriye û pûtên we şikandiye. Li ser vê yekê Malik biryarê dide ku bi ser misilmanan ve derkeve seferê û ji Mesûd bîn 'Urwe re dibêje ku tevî jin zarok û hemû kes ji bo herbê amade bin. Li aliyê Misilmanan jî Cebraîl tê xeberê dide wan ku Malik ji bo seferê amadehiyê dike. Ji wan re dibêje ku dê Xwedê serkeftinê bide we. Li ser vê yekê misilman ji bo cengê dikevîne rê. Di rê de misilman rastî ejderha û cinan tên û ji wan ditirsin. Hz. Muhemmed, Îmamê Elî bi ser ejderhayê ve dişîne da ku wî bikûje. Li ser vê bûyerê ejderha tê ziman û dibêje em jî misilman in û ji bo alîkarîya we hatine. Ejderha û artêşa misilmanan dikevin rê. Di maweya herbê de ji aliyê Şeytan ve tê gotin ku Hz. Muhemmed hatiye kuştin. Li ser vê gotegotê artêşa misilmanan belav dibe û li dor pêxember tenê çend kes dimînin. Li ser vê yekê Hz. Muhemmed bangî misilmanên ku terka wî kirine dike, lê ji ber alozî û heyteholê deng naçe wan. Li ser vê yekê pêxember ji apê xwe 'Ebbas re dibêje tu gazî bike. Li ser gazîkirina 'Ebbas misilman careke din berhev dibin. Di dema şer de Îmamê Elî birîndar dibe û Hz. Muhemmed wî bi awayekî mucizewî sax dike. Li ser vê yekê mirovekî kor tê cem Hz. Muhemmed û jê dixwaze ku wî ji baş bike. Hz. Muhemmed çavên wî kesê kor ji baş dike. Piştî Hz. Muhemmed kesên misilman teşwîqê şer dike. Paşe Îmamê Elî û Sebîeyd şer dikin û Îmamê Elî wî têk dibe. Piştî misilman bi ser dikevin û herb diqede. Piştî cengê Malikê kurê 'Ewf û 'Urweyê kurê Mesûd dibin misilman.

3.3.1. Di Xezwetu Huneynê de Teswîrên Cengê

Di Xezwetu Huneyna Alikî de zimanekî sade yê gel hatiye bikaranîn. Dema li zimanê cureya cengnameyê tê mêzekirin tê dîtin ku axlebî bi zimanekî sade, herikbar û hêsan hatine nivîsîn. Lewra di van berhemana de armanc ne zimanekî edebî û uslûbeke giran e, armanca van berhemana xweşwextderbaskirin û balkişandin e û bi taybetî di cengnameyên Îmamê Elî û Muhemmed Henîfe de xala sereke teblîxkirina dîne Îslamê ye. Ji ber vê yekê ji bo ku gel bi hêsanî ji van berhemana fêhm bikin ev berhem bi zimanekî xwerû û hêsan hatine nivîsîn.

Di cengnameyê de teswîrên cengê bi awayekî zelal, herikbar û balkêş hatine vegotin. Helbestvan bi van teswîran bi mirov maweya şer û cengê dide hîskirin û jîyandin. Bi vegotina helbestvan mirov xwe di nava cengê de hîs dike. Weke mînak:

Bi rê ketî 'esker e
Meymen e hem meyser e
Rastê Sîdîq Ekber e
Li çep 'Emîr 'Umer e

Li pêş 'Elî Heyder e
Li ortê pêxember e
Xalis nûra Ekber e
Ji wechan nûr çû der e

Dengê zîkr û tehlîlan
Hayûhûyê emîran
Li deştê bûne leylan
Kîşyane ser rezîlan

...
Lewra pur xedar bûn
Hindek şubhê mar bûn
Dirêj wek çînar bûn
Xayet ew dujwar bûn

Hinek şubhê gurgan
Pencê wan wek zergan
Ketne reqs û fîrgan
Diran wek qocigan

Hin hût û neheng in
Hin şêr û piling in
Sed heybet bi deng in
Hem bi perr û çeng in

Bi van teswîrên ku helbestvan kiriye, mirov dikeve atmosfera cengê û xwe di nav şer de hîs dike. Ji ber sadebûn û hêsanbûna zimanê Alikî kesê ku vê berhemê bixwîne dikare bikeve nava van hest û ramanan. Di metnê de dengê şûran, tîran û gurzan tevî hev dibin; ji alikî ve qêrîna jin û zarokan ji alikê ve herikîna xwîne û ji alikê ve ax û nalîn tevî hev dibin. Alozi û şer xwe di metnê de bi awayekî aşkere dide der.

Gurzek l' Zubeyr bar kir
Wezna wî giran bû
Super wî ihzar kir
Di bin da punhan bû
Ew li Zubeyr bar kir
Sed û çil batman bû

Zubeyr şûr kişandî
Carek lê hewar kir
Serî hilfirandî
Ew lahiqê nar kir

...
Ji hay û hû mêran
Seh nekirin deng e
Sed heb ji dilêran
Tenê kirin ceng e
Wana kafir hêran
Bi gurzê xeleg e

...
Şinge-şingê şûran
Tijî bû dunya'ê
Gujje-gujê tîran
Ji heddê qet na'ê

Rimmê di rimbazan
Ciger qul dikirin
Bi derbê çomaxan
Serî hûr dikirin

Herb e herb e herb e
Danîn hev du derb e
J' ber gurzê dilêran
L' kafran çê bû kerb e

...
Kafir revîn temamet
Çûne Kela Ta'ifê
Li wan çê bû qiyamet
Û hem çêbû ze'îfî

Hinek ji wan esîr bûn
Hinekan kir firar e
Hinek ji wan qetil bûn
Ew çûne nava nar e

Dora gelî girêdan
Bû gazî yû hewar e
Islamê ne're radan
Hal kafira firar e

3.3.2. Zimanê Xezwetu Huneynê

Di Xezwetu Huneynê de zimanekî sade yê gel hatiye bikaranîn. Her çiqas tê de bêje, peyv û terkîb ji zimanên weke Erebi, Farisî û Tirkî hebin jî ev yek zimanê berhemê giran nekiriye û metna berhemê bi hêsani tê fêmkirin. Herwiha Mela Yasîne Alikî di vê berhemê de gelek hunerên edebî jî bi kar anîne. Mela Yasîne Alikî jî ji bo hêz û tesîra gotina xwe zêde bike serî li biwêjan daye û di berhema xwe de di çendîn cihan de cih daye biwêjan. Hin biwêjên ku di cengnameyê de derbas dibin ev in: “Nebe hevalê dunya’ê”, “Te d’got qiyamet” e, “Dest li wana sar bû”, “Xaba xefletê”, “Xuda hez ke” û hwd.

Di axaftina rojane de ji bo ku axaftin bihêz bibe cotepeyv tîk bikaranîn. Dema li cengnameya Alikî tê mêzêkirin tê dîtîn ku Alikî jî ji bo hêza vegotina xwe xurt bike gelek cotepeyv bi kar anîne. Cotepeyvên di berhemê de derbas dibin weha ne: mesken û cah, cewr û cefa, fewc û fewc, hay û hûy, çol û çolistan, derb û derbûstan, cin û canan, sef bi sef, xulxul, nar û nûr, şinge-şing, gûjje-gûj, sewt û seda, zarezar, gav bi gav, pêda pêda, serteser, parepar, da û baban, xerdexûr, qelb û cenah, celeb celeb, xalxal, dûrlû dûrlû, pişt û penah, qed û qamet, can û ciger, qîl û qal, hir hir, parepar, qal û qîl, kar û zar.

Di Xezwetu Huneynê de hin xisûsiyeten devokên Serhed û Behdînanê tîk dîtîn, ev yek li jêr bi mînakani hatiye îzêhkirin.

Devoka Serhedê: Mela Yasîne Alikî ji devera Serhedê ye ji ber vê yekê tesîra devoka Serhedê di berhema wî de bi awayekî berbiçav tê xuyakirin. Ev devok li bajarên weke: Mûş, Erzirom, Agirî, Bedlîs, Çewlig, Dîyarbekir û li hin deverên Wanê tê axaftin (Yonat, 2020: 416). Ev devok hin taybetîyên herêmî di xwe de vedihewîne. Mela Yasîne Alikî jî van taybetîyan di berhema xwe ya bi navê Xezwetu Huneynê de bi kar anîne.

Di devoka Serhedê de herfa “w”yê zêde nayê bikaranîn, ango di gelek bêjeyan de ev herf ketiye. Di cengnameya Alikî de bêjeyên “daxwaz”, “duwazdeh”, “xwarê”, “xwîn” û “xwelî” bi rêzê weke “daxaz”, “dazdeh”, “xarê”, “xûn” û “xalî” hatine nivîsîn. Herwiha di devoka Serhedê de daçekên “de, ve, re” bi pirani weke “da, va, ra” tîk bikaranîn. Di berhemê de hin bêjeyên ku bêtir li devera Serhedê tîk bikaranîn cih digirin, weke: “ciger (ceger), vewestan (westîn), Seh kin (seh bikin), bira (bila)”.

Di devoka Serhedê de zayend gelek caran tê tevlihevkirin. Hin tiştên ku zayendên wan nêr bin weke mê tîk bikaranîn yên mê jî weke nêr. Ji ber vê yekê di mijara zayendê de tevlihevî derdikeve holê. Di metna cengnameyê de jî ev tevlihevî heye. Helbestvan di hin cihan de li şûna zayenda “nêr” zayenda “mê” bi kar anîye. Weke:

Ez hatim piş da sekinim
Dest avête xencerê
Derbekê wisan ku lê xim
Ew şehîd be l' wê derê

Herwiha ji dêvla zayenda “mê” jî zayande “nêr” bi kar anîye. Weke:

Gazî min kir ez ku çûm
Çê bû li min xewf û xeter
Dest li **singê** min malandî
Kir di'ayek mu'teber

Devoka Behdînan: Behdînan; Navê herêmekê ye ku li Kurdistana Iraqê ye, bi awayekî giştî ev herêm ji bajarên Dihok, Zaxo, Amediyê, Aqrê û Şêxanê ve ku li bakurê Mûsilê dikevin pêk hatiye. Piraniya vê herêmê di nav sînorên bajarê Dihokê de dimîne (Işık, 2017: 96). Kurdên ku vê devokê dipeyivîn weke Behdîni hatine binavkirin.

Di nav berhema Alikî de hin bêje û peyvên devoka Behdînan hatine bikaranîn weke: biçîtin (biçin), bibît (bibin), nabit (nabe), xo (xwe).

3.4. Kesayetên Girîng ên Xezwetu Huneynê

Di Xezwetu Huneyna Mela Yasînê Alikî de navê gelek şexsan derbas dibe. Hin ji van kesayetên misilman in, hin ji wan paşê bûne misilman û hin ji wan jî nebûne misilman. Bi tevahî di Xezwetu Huneyna Alikî de 26 kesayet derbas dibin. Kesayetên Misilman ên di berhema Alikî de: Hz. Muhemmed (s.x.l.), Hz. Hemze, Hz. Ebûbekir, Hz. Omer, Hz. Osman, Îmamê Elî, Zubeyrê Kurê Ewwam, Fazilê Kurê Ebbas, Ebbas, Ebbasê Kurê Mirdas, Se'd Kurê 'Ubade, Se'd Kurê Ebû Weqqas, Ebû Sufyan, Ebû Sufyan el-Haşimî, Qetadê Kurê Nu'man, Enesê Kurê Malik, Şeybe Kurê Osman, Xalidê Kurê Welîd, Mîqdadê Kurê 'Ebdullah, Bilalê Hebeşî, Qeysê Kurê Se'd, Ejder (Eşter). Kesayetên ku paşê bûne Misilman: Malikê Kurê 'Ewf, 'Urweyê Kurê Mes'ûd. Kesayetên ku nebûne Misilman: Nacî û Sebî'eyd in.

Bûyerên cengnameyên Îmamê Elî li derdora kesayeta Hz. Muhemmed û Îmamê Elî diqewimin, ji ber vê yekê li jêr bi hûrgûlî behsa van her du şexsan hatiye kirin.

Hz. Muhemmed (s.x.l.)

Hz. Muhemmed di sala 571ê de li Mekkeyê hatiye dinyayê, navê bavê wî Ebdullah e û navê dîya wî Amîne ye û navê kalê wî jî Ebdulmutalîb e. Ji ber ku ji nesla Hz. Îbrahîm e jê re weke Îsmailî jî hatiye gotin. Di 25 salîya xwe de bi Hz. Xetîceyê re zewicîye û ji vê zewacê heft zarokên wî çê bûne. Hz. Muhemmed di 40 salîya xwe de di sala 610an de bûye pêxember û dest bi belavkirina dînê Îslamê kiriye. Hz. Muhemmed ji bo belavkirina Îslamê beşdarî şerên weke Bedir, Uhud, Zatu'r-Rika, Benî Nadîr, Xendek, Qureyza, Benî Mustalîq, Xeyber, Mute, Fetha Mekke, Huneyn û Tebukê bûye. Hz. Muhemmed di sala 632yan de li Medîneyê wefat kiriye (Fayda, 2005: 408-423).

Bûyera ku di cengnameyê de derbas dibe li dor Hz. Muhemmed hatiye hûnandin ji ber vê yekê di gelek cihan de nav û sifetên ku ji bo Hz. Muhemmed hatine gotin derbas dibin. Nav û sifetên ku ji bo Hz. Muhemmed hatine gotin ev in: Muhemmed, Muhemmed Mustafa, Ehmed, Pêxemberê Nûranî, Xalis Nûra Ekber, Nebî, Babê Fatma'ê, Nebîyê Serwer, Xetm'ul-Murselîn, Resûlê Kibirya, Şahê Cihan, Fexru'l-Umem, Fexrê 'Alem, Hezretê Resûl, Resûllah, Resûlê Girdigar, Pêxember, Resûlê Zûl-Celal, Resûlê Ins û Can, Hebîbûllah, Resûlê Nûranî û Resûlê Heq.

Îmamê Elî

Li gor rîwayetan Îmamê Elî (Hz. Elî) 22 salan berî hicretê li Mekkeyê hatiye dinyayê. Dîya wî Fatima ye, bavê wî jî Ebû Talîbê apê Hz. Muhemmed (s.x.l.) e. Ji ber xelayê ji pênc salîya xwe heta hicretê li cem Hz. Muhemmed maye û yek ji wan kesên ewil e ku bawerî bi Hz. Muhemmed anîye û di heman demê de zavê pêxember e. Di çavkanîyan de agahiyên derheqê jîyana wî ya berî hicretê de kêman in. Îmamê Elî beşdarî gelek herban bûye û di van herban de senceqdarîya pêxember kiriye. Her çiqas di herbên weke Uhud û Huneynê de bîrîndar bûbe jî heta dawî Hz. Muhemmed parastîye. Îmamê Elî katibîya pêxember kiriye û wehî nivîsîne. Îmamê Elî piştî Hz. Osman dibe xelîfeyê çarem. Îmamê Elî di sala 556an de bûye xelîfe û heta sala 661an xelîfeti kiriye. Îmamê Elî di sala 661ê de ji alîyê kesekî bi navê Ebdurehman Harîcîyê kurê Mulcem ve hatiye kuştin. Îmamê Elî ligel cengawerîya xwe li ser Qur'an û hedîsan jî xwedî zanîneneke baş bûye. Hz. Ebûbekir û Hz. Omer ji ber vê zanîna wî gelek caran alîkarî jê xwestine (Fîğlatî, 1989: 371-374).

Îmamê Elî hem ji ber ku pismamê Hz. Muhemmed e, hem ji ber ku zavê wî ye û hem jî ji ber ku yek ji wan kesên ewil e ku bawerî bi Îslamê anîye di dîroka Îslamê de xwedî cihekî girîng e (Gümüşkılıç,

2012: 146). Ji ber vê yekê Îmamê Elî di nav gel de bêtir hatiye hezkirin û li ser wî çîrokên cengawerîyê hatine gotin.

Di metna vê cengnameyê de Îmamê Elî roleke çalakger dilîze û weke qehremanekî bêemsal derdikeve hemberî me. Ti kes miqabilê cengawerîya wî nîne, bi halê xwe yê bîrîndar jî dîsa li dijî dijmin şer dike. Ji ber vê lehengîya wî di edebîyatê de li ser wî cengname hatine nivîsîn. Piştî Hz. Muhemmed di cengnameyê de herî zêde qala Îmamê Elî tê kirin û cengawerîya wî derdikeve pêş. Ji ber vê hindê gelek sifet û nav ji bo wî hatine bikaranîn. Nav û sifetên ku ji bo Îmam Elî di metnê de derbas dibin ev in: Şêrê Ekber, Şah, Heyder, Heyderê Kerrar, Şahê Merdan, Elî Heyder, Îmamê Heyder, Îmam, Şahê Heyder, Elî Şêrê Xuda, Şêrê Muhemmed, Şahê Dîn, Şêrê Heq, Şêrê Şikarî û Sahibqiran.

ENCAM

Mela Yasînê Alikî helbestvanekî sedsala 20em e, li Panosa Agiriyê hatiye dinê û li wir wefat kiriye. Alikî carekê zewicîye û ji vê zewacê heft zarokên wî çêbûne. Alikî li ba çendîn aliman perwerde bûye û îcazeya ilm û tesewîfê wergirtiye. Herwiha wî melatî û muderîsî kiriye û ders daye gelek telebeyan. Heta niha 5 helbest û berhema wî ya bi navê Xezwetu Huneynê hatine tesbîtkirin. Berhema wî ya bi navê Xezwetu Huneynê li ser Cenga Huneynê ye ku di serdema Hz. Muhemmed de qewimîye.

Heta niha 3 nusxeyên destxet ên Xezwetu Huneynê hatine tesbîtkirin. Ji van nusxeyan Nusxeya Yusuf Yaşar nusxeya herî berfireh bû. Ev nusxe li cem malbata Yusuf Yaşar e. Nusxe bi tevahî 61 wereqe ye. Di vê nusxeyê de ji bilî metna Xezwetu Huneynê helbesteke bi Tirkîya Osmanî jî heye. Nusxeya duyem nusxeya Muhemed Emîn bû. Ji temeta wê tê fêmkirin ku mustensîxê vê destxetê talebeyê Mela Yasînê Alikî Muhemmed Emîn e. Ev nusxe ji 22 wereqeyan pêk hatiye û nusxe bê berg e. Nusxeya sêyem Nusxeya Mela Huseynê Botî ye. Mela Huseyn zavê kurê Feqe Reşîdê Alikî ye. Mela Huseyn di sala 1954an de ev nusxe îstînsax kiriye.

Cenga Huneynê yek ji wan herban e ku di dewra Hz. Muhemmed de bi mişrikên Hewazîne re hatiye kirin û di dawîyê de misilman bi ser ketine. Berhema Alikî bi awayekî menzûm behsa vê cengê dike. Berhema Alikî ji 373 bendan pêk hatiye û ji 373 bendan 27 şeşîne û 346 jî çarîne ne. Berhem bi gelemperî bi kêşa birgeyî hatiye nivîsîn, lê di helbesta nav cengnameyê de kêşa erûzê hatiye bikaranîn.

Di Xezwetu Huneynê de zimanekî sade yê gel hatiye tercihkirin, her çiqas bêje û terkîbên ji zimanên biyanî hebin jî metn bi hêsanî tê fêmkirin. Cengname ji ber ku behsa şer û cengê dike tê gelek peyv û bêjeyên ku bi şer û têkoşînê re eleqedar in derbas dibin. Herwiha ji ber ku behsa şerekî dînî dike tê de gelek peyv û têgehên dînî jî derbas dibin. Herwiha di cengnameya Xezwetu Huneynê de taybetîyên devokên Serhed û Behdînanê têne dîtin. Helbestvan ji bo hêza vegotina xwe xurt bike di Xezwetu Huneynê de gelek caran hunerên edebî, cotepeyv û biwêj bi kar anîne.

Di cengnameyê de qala gelek kesayetên serdema vê cengê tê kirin, bi taybetî di Xezwetu Huneyna Alikî de Hz. Muhemmed û Îmamê Elî cihêkî berfireh digirin û hemû bûyer li dor her duyan hatiye hûnandin. Ev her du kes di Xezwetu Huneynê de bi gelek sifet, nav û unvanên cuda derbas dibin.

Cengnameya Alikî her çiqas ne bi teşeya mesnewîyê hatiye nivîsîn jî tê de xisûyetên teşeya mesnewîyê jî têne dîtin. Herwiha di cengnameyê de ji aliyê teşeyê ve wekhevî tune ye, lewra helbestvan hin cihên cengnameyê weke çarîne nivîsîne û hin cihan jî weke şeşîne nivîsîne. Yanî di cengnameyê de pergaleke nivîsîne tune ye. Di Xezwetu Huneynê de dibace, sebebê te'lifê, dîroka te'lifê, beşa sereke (mîjar) û beşa xatîmeyê cih digirin. Ji dibaceya metnê tê fêmkirin ku helbestvan xwestîye qîsseya Cenga Huneynê bi Kurmancî jî were xwendin û ji ber vê yekê ev berhema xwe nivîsîye.

Çavkanî

- Aça, M., Gökalp, H., Kocakaplan, İ., (2012). *Başlangıçtan Günümüze Türk Edebiyatında Tür ve Şekil Bilgisi*. İstanbul: Kesit Yayınları.
- Adak, A. (2019). *Teşeyên Nezmê di Edebîyata Kurdî ya Klasik de*. Stenbol: Weşanên Nûbihar.
- Akkuş, M. (2007). *Klasik Türk Şiirinin Anlam Dünyası*. Erzurum: Femomen Yayınları.
- Artun, E. (2013). *Dini-Tasavvufî Halk Edebiyatı*. Adana: Karahan Kitabevi.
- Atalan, M. (2009-Mayıs). Türk Kültüründe Hz. Ali Cenknâmeleri. *e-Makalat Mezhep Araştırmaları Dergisi*, c.1, s.2, s.a. 7-27.
- Atalan, M. (2011-Şubat). Anadolu'da Cenknâmelerin Toplumsal Yansımaları. *Kelam Araştırmaları*, c. 9, s.1, s.a. 45-56.
- Bişaroğlu, S. (2022). *Cengnameye Hezretî Eli: "Gezwetu Huneyn" a Mela Yasîne Alikî (Metin û Lêkolîn)*. Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî. Mêrdîn: Zanîngeha Mardîn Artukluyê. Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî.
- Cegerxwîn. (2014). *Sewra Azadî*. Stenbol: Weşanên Avesta.
- Çalışır, R. (2019). *Destana Rustemê Zal*. Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî. Mêrdîn: Zanîngeha Mardîn Artuklu. Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê Beşa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî.
- Çetin, A. M. (2020). *Şimdi: Hayatım, Hicretim Şeyh İsmail Çetin Hazretleri*. Isparta: Dilara Yayınları.
- Çetin, İ. (1997). *Türk Edebiyatında Hazret-i Ali Cenknâmeleri*. Ankara: Kültür Bakanlığı Yayınları.
- Çetin, İ. (2014). *Edeble Varış Lütüfla Dönüş*. Isparta: Dilara Yayınları.
- Demir, R. (2019). *Manzum Hz. Ali Cenklarından Yemâme Cengi Üzerine Bir İnceleme*. Yayınlanmamış Yüksek Lisan Tezi. Kastamonu: Kastamonu Üniversitesi. Sosyal Bilimler Enstitüsü Türk Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı.
- Develioğlu, F. (2017). *Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lûgat*. Ankara: Aydın Yayınları.
- Duisenov, N. (2011). *Sebep ve Sonuçlarıyla Huneyn Gazvesi*. Yayınlanmamış Yüksek Lisan Tezi. Konya: Selçuklu Üniversitesi. Sosyal Bilimler Enstitüsü İslam Tarihi ve Sanatları Anabilim Dalı İslam Tarihi Bilim Dalı.
- Fayda, M. (2005). *H. Muhammed*. DİA. (c. 30, 408- 423): İstanbul Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları.
- Fiğlatlı, E. R. (1989). *H. Ali*, DİA. (c. 2, 371-374). İstanbul: Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları.
- Galotta, A. (1981). Ğazavât-ı Ğareddîn Pâşâ, (Wer. Salih Akdemir). *Beleten Dergisi*, c. 47, s. 2, s.a. 473-500.
- Gümüşkılıç, M. (2012-Nisan). Bir Gazavat-Nâme Etrafında Hz. Ali'nin Halk Muhayyilesindeki Yeri. *The Journal of Academic Social Science Studies*, c. 5, s. 2, s.a.145-155.
- Gümüşkılıç, M. (2013-Kış). Cumhuriyet'te Hz. Ali'nin Özellikleri. *Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi The Journal of International Social Research*, c. 6, s. 24, s.a.142-152.
- Gür, S. (2022). Kültürümüzde Dinî ve Cengi Hikâyeler. *Erdem Dergisi*, 191-196.
- Işık, İ. S. (2017). *A'dan Z'ye Kürtler- Kişiler, Kavramlar*. Stenbol: Weşanên Nûbiharê.
- Kaplan, Y. (2019). *Beyt û Destanên Kurdî*. Stenbol: Weşanên Nûbihar.
- Karak, M. Z. & Zadesafarî, M. Du Cengnameyên Goranî (Xebata neçapbûyî).
- Koyuncu, Z. (2020-Haziran). Edebî Türlerden Cenknâme/Gazavat-name karşılaştırması ve Muhammed Hanefî- Tabut Cengi'nin Yeni Bir Nüshası. *Alevilik-Bektaşilik Araştırmaları Dergisi*, s. 21, s.a. 137-138.
- Mattei, J. L. (2004). *H. Ali Cenknâmeleri*. İstanbul: Kitabevi Yayınları.
- Özcoşar, İ. & Vali, S. (2017). *Osmanlı Devleti ve Kürtler*. İstanbul: Kitapyayınevi.
- Reşid, F. (2020). *Sirru'l Mehşer*. (amd. Ahmet Gemi, M. Nezîf Katılmış).Wan: Weşanên Peywend.
- Sarıkaya, M. (2012). Halk Dilinde Bir Duâ Mecmûası: Bilâl Nûrî Münâcâtı. *İstanbul Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, S. 27, n.r. 113-146.

Seher KARAK

Cengnameyeke Kurdi: Xezwetu Huneyna Mela Yasîne Alikî

Şulul, K. (2015). *Ana Hatlariyla Siyer-i Nebî. İstanbul: Ensar Yayınları.*

Toprak, İ. (2016). *Hazret-i Ali Cenklere. (2. Baskı). İstanbul: Büyüyenay Yayınları.*

Vali, S. (2021). *Şahnameya Kurdi Rustemê Zal û Heft Xana Wî. Stenbol: Weşanên Avesta.*


Yonat, M. (2020- Kasım). Di Devokên Kurdîya Kurmancî de Zayenda Rewşên Morfolojîk (Mînakên Devokên Bakur, Başûrê Rojhilat û Başûrê Rojavayê). *Mukaddime*. hej. 11, n.r. 410-445.

PÊVEK


Pêvek 1: Rûpelek ji Serî û Yek ji Dawîya Nuxxeya Yusif Yaşar.




Pêvek 2: Rûpela Yekem a Nusxeya Muhemmed Emîn.



Pêvek 3: Rûpela Dawî ya Nusxeya Muhemmed Emîn.



Pêvek 4: Rûpela Yekem a Nusxeya Mela Huseynê Botî.



Pêvek 5: Rûpela Dawî ya Nusxeya Mela Huseynê Botî.

